

Serokê Enstituya Kurdî ya Brukselê Ferho: Konferansa li ser Êzdayetiyê serkevtî bû

Gabar Çiyan

Berî nuha bi demek e kin konferansê li ser Êzdayetiyê li Beljîkayê pêk hat. Hejmarek kesên pisporek beşdar bûn û pirs ji gelek awiran ve hate nirxandin. Em bi Serokê Enstituya Kurdî ya Brukselê Derwêş M. Ferho re axifîn. Em hevpeyvîna pê re, pêşkêşî we dikin.

Konferansa çî demê çêbû û kî organîze kir û armanca organîzekirina konferansê çî bû?

Konferansa di 2009, 10ê Adarê de
derbas bû û ji aliyê,

Interdisciplinair Centrum

Religiestudie &

Interlevensbeschouwelijke

Dialoog (Zanîngeha Katolîk ya
Leuven), di bin serokatiya **Prof.**

Dr. Bert Broeckart de, bi
hevkarîya **Enstituya Kurdî ya**
Brukselê hate amade kirin û

armanca organîzekirina vê konferansê bi awayekî zanistî axaftina li ser ola Êzdayetiyê
bû. Konferansa li KULeuven (Zanîngeha Katolîk ya Leuven), Kleine Aula, Maria-Theresia
College, Sint-Michielsstraat 6 – 3000 Leuven – Beljîka, derbas bû.



Nêzikayîya organîzasyonên Êzdiyan li konferansê çawa bû?

Êzîdî di vê konferansê de pirr kêr hebûn. Kesê axaft ne tê de 4 kesên din hebûn. Ji xwe,
mîna gelek carên din, armanca Enstituyê ne ew e ku gelek Kurd di çalakiyên me de
beşdar bibin. Armanca me ya sereke ew e, ku Beljîkî û Ewropî di çalakiyên me de beşdar
bibin û pirsê Kurdan bi giştî hîn bibin. Di salonê de ji sedî zêdetir guhdar hebûn. Ew bi
tevahî xwendekarên zanîngehê bûn ku pîrriya wan master, doctorat, lêkolînên teybetî
û mamosteyên xwendegêhên cihê bûn. Ji ber van sedeman axaftinek li ser nêzikayîya
kes yan organîzasyonên Êzdiyan ne rast e. Ez dikarim weha bêjim: Hem kes hem
organîzasyonên ku haya wan ji vê Konferansê hebû pirr dilxweş û razî bûn.

Ji bilî kurdan kî beşdar bû û bêhtir qala çî kirin?

Wek min li jor jî got Kurd kêr beşdar bûn. Pîrriya guhdaran Beljîkî bûn.

Doktorandus û senatorê berê **Hugo Van Rompaey** li ser pirsê Kurdî bi kurtayî xaft û çî
da **Dr. Memo Ferhan Osman** û wî bi kûrayî li ser bawerîya Êzdayetiyê, dîrokî û civakî
axaft. Herweha rewşa îroyîn ya Êzdiyan jî ew axaft.

Êzdayetî oleke kevn e û xwedî gelek teybetî ye. Di nava olên mîna Cihû, Zerdestî,
Xiristîyanîzm û Îslamê de ew teybetiyên wê xuya dikin.

Êzîdî ji aliyê Misilman û Xiristîyanan ve bi parêzvanên tiştêkî têne tewanbarkirin. Sedema
wê jî ew e ku di bawerîya Êzdayetiyê de hem tistên xêrê û hem jî tiştên şer di biryar û
encamên karê Xweda de hene.

Li Rojhilata Navîn Êzîdî bi sedsalan bûne hedefa zor û zilmê. Ev zor û zilm heta îro heye.
Çiqa Êzîdî li cîhanê hene nayê zanîn. Lê ew di navbera 500 000 û 1 000 000 de ne. Êzîdî
bi eslê xwe Kurd in. Ji bo ew nebin Misilman berxwedaneke xurt kirine.

Bi giştî li ser van esasan hat axaftin û bala xelkê glekî kishand.

Bi giştî nêzikayîya ronakbîr, Hikumeta Herêmê û xelkê li Konferansê çawa bû?

Nêzikayîya ronakbîr, Hikumeta Herêmê û xelkê li ser Konferansê çawa bû ji min re jî
gelekî meraq e. Ji xeynî sê-çar ronakbîrên Kurd, ew jî ji ronakbîrên Sovyetê, ne

ronakbîrekî din û ne jî Hikûmeta Herêmê bi qasî misqalekê jî deng ji wan nehat! Nêzîkayî çiqas be dive meriv ji wan bipirse.

Dîtina hikumeta herêmê li ser maf û parastina Êzidiyan çi ye?

Li ser dîtina hikumeta herêmê li ser maf û parastina Êzidiyan meriv dikare ji rewşa gishtîm zelal bibîne. Dibe ku ji sedema gelek pirsgirêkên herêmê di nava dewleta federal ya Iraqê de hene û ji ber vê yekê jî ew nikarin bi awayekî ku mina dil dixwaze li ser van pirsan rawestin. Lê her çi be bila bibe maf û parastina Êzidiyan li herêma Kurdistan û di nava Iraqê de pirr xerab in. Ew li ber jenosîdekê rû bi rû sekinîne. Eger melayek di mizgeftê de xutbê li ser komkujiya Êzidiyan bikaribe bixwîne, ew xutba wî li her derê dinyayê bigere û heta niha jî ew mele serbest bigere, Êzîdî di xetereke mezin de ne.

Beşdarên konferansê bi giştî li ser çi xalan rawestiyan?

Beşdarên konferansê bi giştî li ser xalên kok, naverok, felsefe, coğrafye, etnografye, folklor û kultûra Êzdayetiyê ya kevn û nuh rawestiyan.

Hûn çiqasî gihîştin armanca xwe?

Armanca me ew bû ku em Êzdayetiyê mina ol bidin nasandin. Bi awayekî vekirî ev xal hate axaftin û beşdar razî bûn. Lê li ba dilê min tiştê herî girîng ew bû ku **Prof. Dr. Bert Broeckaert**, di dema xwarina êvarê de ji min û hevalên din re soz da:

1. em bi hevra di sala 2011 de konferanseke gelekî mezin, bi beşdariya 20 heta 25 profesor, di zanîngehê de amade bikin û du roj li ser vê olê dirawestin.
2. **Prof. Dr. Bert Broeckaert**, li Herêma Hasselt **Navenda Olên Cîhanê** ava dike. Wezaretê Perwerdê ev proje bi berferehî pejirandiye. Ewê di wê navendê de cî bide Ola Êzdayetiyê jî. Ango, Arşîf, bibliotheek, film, foto, orf û adedên Êzidiyan ewê di vê muzeyê de bi awayekî fereh cî bigrin.

Konferans bi zimanê Ingilîzî bû.

Zarathustra News – zarathustra_news@comhem.se